

Benca Gelemperî

Rêbernameyek bo Ciwanan

Benca gelemperî

Benca gelemperî ew e ku dema bijîşkên bencekir dermanekî (yan carna gaz a benckirê) bikarînin, da ku we bixe rewşek mîna xweke kûr, di wê pêvajoyê de jî yek nikare çî tiştî bibîne, bibihîze an jî hîs bike. Ev tê wê wateyê ku hûn bêhişin û nikarin şiyar bibin heya bandora benckirê xelas nebe. Benca gelemperî girîng e bo gelek rêbaz û rêgezên bijîşkî, wek niştergerî (neştergerî) û lidarxistina hinek testên dermankirinê.

Tîma benckirinê

Bijîşkên penckirinê, ew pispor û bijîjkên ku rahînan kirine bo karanîna dermanên bencê daku mirov geşdar û ewledar bin di dema neştergeriyê û/yan di dema lidarxistina testan da. Hûn û dêûbavên we yan nihêrvanên we, berî çî kareriyên, dê hevdîtinê digel bijîşkên benckir da bikin. Ew ê planek bi we re bipejirînin ji bo benckir û sivikkirina êşê we piştî niştergeriyê. Ew dê kêfxweş bin ku bersiva her pirsên we bidin. Karmendên din dê alîkariya bidin bijîşkên bijîşka benckirinê di dema niştergerî yan lidarxistina testan. Wek nimûne, alîkarên benckirinê, karmendên beşa xebitandinê (ODP carinan jêre têne gotin) û hemşîreyên odeya niştergeriyê.

Dibe ku çend heffî an roj berê hûn bîn vexwendin bo nixandina berê niştergeriyê ya klînîkê. Li wê dera dê hemşîre pirsan derbarê tenduristiya we bikin û çî testên pêwîst bi rêk bibin. Ev him jî derfetê dide we û dêûbavên we an nihêrvanên we ku her pirsê bikin.

Razîbûn

Bijîşkê benckir dê digel we û dêûbav we yan nihêrvanên we da bixebite daku plana lînerîna we bipejirî. Hefta ku plan neyê gengeşekirin û lihevkerin bi cih nebe, çî karere naynê kirin. Hûn dikarin bi qasî ku hûn bixwazin pirsan bikin da ku hûn her tiştê ku diqewime zanibin û bi planê re 'razîbibin' (erêkirin). Dema ku hûn ji plana lînerîna xwe ya pêşniyarkirî kêfxweş bin, hûn yan dêûbavê we yan nihêrvanê we dê belgeya razîbûnê îmze bikin. Dêûbav an nihêrvanê we dê hewce bike ku razîbûna we ji bo niştergeriya we bipejirîne heke hûn mezin nebin ku hûn nameya qebûlkirina xwe îmze bikin. Her ku hûn mezintir bibin, hûn dê di meseleyên wisa bêhtir xwedî biryara xwe bin.

Hûn dikarin bêhtir derbarê qebûlkirin/erêkirina bo zarokan û ciwanan li xwar bixwînin:

Îngilîstan: <https://bit.ly/NHS-consent>

Skotlenda: <https://bit.ly/NHSinform-consent>.

Amadekirin bo benckirinê

Tenduristiya we

- Berî ku hûn pencv bibin çiqas hûn tendurist bin dê baştir be Wek çend guhertinan di şêwaza jiyana we ya tenduristî berî ku hûn benckirê bibin, dê ji we ra bibe alîkar ku hûn zûtir baş bibin.
- Ger pêkan be, di şeş hefteyên beriya niştergeriyê da hewl bidin ku ji dûmana cixareyên normal an cixaryên elketronik (vape) yê kesên din nefesê nekişînin. Di heman demê de girîng e ku hûn bixwe cixareyan nekişînin, çî normal be çî elketronik (vape). Dibe ku ji her kesê ku hûn bi wan re dijin, cixarekêş bin yan cixareyên elketronik bikişî, daxwaz bikin ku di vê demê da li derve bikêşin. Terka cixarekêşanê an kêmkirina wê di demek kurt de berî neştergeiyê, dikare dirêjîya mayîna we li nexweşxaneyê kêmkirî bike û başbûna birînan û fonksiyona pişa spiye baştir bike.
- Divê hûn alkolê di roj û hefteyên berî niştergeriyê venexwin. Vexwarina zêdeya alkol dikare bandorê li fonksiyona kezba we bike û pêvajoya başbûnê derengtir bike.
- Ji bo ewlehiya xwe, divê bijîşkê benckir bizanbe hûn li ser çî cureyên hebên kontrolkirina zayînê, yan dermanên dilşahiye yan çî cureyên pêvekî bin.
- Dema ku bijîşkê benckir pirsên derbarê cixarekêşanê, vexwarinê û madeyên hişbir ji we dikin, ji kerema xwe rastiye bêjin. Em dizanin ku gotûbêjkirina van mijaran dibe ku we nerehet bike, ji ber vê yekê eger hûn dipejirînin ku dêûbavê we yan nihêrvanê we ne amade bin di gotûbêjê de, hûn dikarin bixwazin bi tenê bi bijîşkê benckir re biaxivin. Dirustbûn nayê wê wateyê ku hûnê rasfî pirsgerêkan bîn!
- Eger hûn neştergerî hebe, divê hûn li ser parêz û saxlemiya xwe raman bibin. Hûn dikarin ew dema berî niştergeriyê bikar bînin ta ku hûn saxlemiyek û laşekî herî tendirûst bi dest xin. Ev yek dê alîkar be ku hûn zûtir baş bibin û bileztir vegehin jiyana xwe ya rojane. Hûn dikarin agahiyên zêdetir derbarê amadekirina bo niştergeriyê ser malpera me bi zimanên cuda peyda bikin:
www.rcoa.ac.uk/patientinfo/translations#languages.
- Ger pirsgerêka bijîjkiya we yê demdirêj ku baş nehatine kontrol kirin, hebin, divê hûn yan dêûbavê we yan nihêrvanê we berî roja niştergeriyê bi Bijîşkê Giştî yan pisporê we ra têkilî daynin û haya wan jê bixin, ku dema benckirina we nêzik bûye. Dûvre hûn dikarin bi wan re bipeyivin ka hûn û bijîşkê benckira we çî gavan divê bavêjin da ku hûn di dema xwe ya nexweşxaneyê da bi qasî ku pêkan ewle bin.
- Her dermanên xwe yê ku bi rêkûpêk dixwin bi xwe ra bînin nexweşxaneyê. karmendên nexweşxanê agahiyên bidine we ger sekinandina dermanan pêwîst be.
- Ger pêkan be, agahiyên derbarê alerjiyên xwe yan endamên malbata we yê ku bertekên laşî diji bencê nîşan dide, da ku hûn bikarin ji bijîşka benckirê xwe re bibêjin.
- Tiştê normal e ku ji bo her keçek ku dema wê dest pê kiribe an ji 12 salî mezintir be, bi riya testa mîzê testa ducaniyê were kirin. Ev yek jiber ku ducanîbûn, ducanîbûna zû jî, dikare bandorê li şêweyên karê benckirê bike. Jiber wê yekê jî pêwîst e haya bijîşkê benckir jê hebe. Hin dermankirin û test jî dikarin zerarê bighînin pitikekî hê ji ku ji dayik nebûyî. Bijîjk û hemşîre têdigihîjin ku dibe ev mijareke hestiyar be bo danûstandinê, jiber wê yekê jî riya herî ewle û dadperwer ew e ku test bo herkesî bêne lidarxistin. Karmendên nexweşxaneyê hîn lidarxistina van testan bûne bi şêweyekî zû û nepenî.

Agahiyên bêhtir dikarin li vir bêne peyda kirin:

<https://flipbooks.leedsth.nhs.uk/LN005583.pdf>.

Xwarin û vexwarin berî benckira we

- Divê nexweşxane şîretên zelal bide we ka divê hûn kengî berî neştergeriyê dev ji xwarin û vexwarinê berdîn.
- Ji bo ewlehîya we girîng e ku hûn van agahiyan bişopînin. Heke di dema penca te de di zikê we de xwarin an jî şilavî hebe, dikare bikeve qirika te û têkeve nav pişikên te. Dibe ku ev yek bibe sedema fetisandin an jî ziyaneke rijd li pişikên we bibe. Hûn dê bi piranî bihên handan da ku hûn mîqdarên piçûktir ên şileyê zelal vexwin (bi gelemperî av an jî squasheke zelal) vexwin - Ev heta ku nêzî dema benckira we be ewle ye.

Cil û berg

- Tiştêkî sist û rehet li xwe bikin ku paşê şûştina wê hêsan be. Cilên nû û giranbiha roja neştergeriyê li ber xwe nekin.
- Bipirsin bê ka divê hûn pîjama, şimik û/an jî kincê cilan bînin yan na.
- Ji bo çûna malê tiştêkî biguherîne bîne.
- Dibe ku ji te re werê xwestin ku tû kincê nexweşxaneyê li xwe bike.
- Bi piranî dema hûn diçin odeya niştergeriyê hûn dikarin piraniya binkirasên xwe bibin, heta pêşîngir jî heke asin têde de tune be, lê bi hemşîreya xwe ra pirs bike. Dibe ku hin caran di dema niştergeriyê an test kirinê da binkiras pêwîst be were rakirin.
- Kêma caran, dibe ku nişterger ji şûna neştergeriyê hinek por kur bike, lê ew ê bi piranî beriya hingê ji we re bibêjin ka ev yek dê pêk were yan na.
- Dibe ku beriya niştergeriyê ji we bê xwestin ku hûn goreyên elastîk ên li ser çokan li xwe kin. Ev alîkariyê dide ku xwîn li dora lingên we baş bilive da ku pêşî li meyinên xwînê bigire.

Gewher û makyaj

- Ji kerema xwe heke bibe, zêr û qulpikên xemlandinê li malê bihêlin. Heger hûn nikarin cewherên xwe bixin, dibe werin rapêçin bi band da ku ziyaneke negihînîn wê an çermê we.
- Ji kerema xwe, xwe makyaj nekin, him jî bijangên sexte daneyinin. Divê hûn dûrî her cureyên neynok-xemlandinê bikevin (neynokên sexte, cêl, akrîk, boyaxa neynokan, hwd). Bijangên sexte dikarin bo çavên we ziyaneke bin dema hûn di xew de bin. Xemlandina neynokan jî dikare xebitandina alavên çavdêrîkirinê rawestîne. Dibe ku pêwîst be ku xebatkarên nexweşxaneyê wan rakin jiber wê dermankirina we dereng bikeve.

Derbas kirina wext

- Li derdorê gelek caran bendewariyek dem heye.
- Tiştêkî bînin (mînak, pirtûkek, kovarek an jî telefona xwe ya destan). Ji kerema xwe ji bîr nekin bargeker û berguhkên xwe jî bînin.
- Ji kerema xwe ji bîr nekin ku di vê bendemayinê da ne cixareyê bikişînin û ne jî benîşt bicûn û bi baldarî rêbazên xwarin û vexwarinê bişopînin.

Dema penckirinê

- Pirê caran bijîşkê benckir dê benca we li jûreyek li teniştê odeya niştergeriyê, ku jê re jûreya pencê tê gotin, dest pê bike. Carinan dibe ku di jûreya niştergeriyê yan tesê bê lidarxistin.
- Bijîşkê benckir a we dê bi gelemperî dest bi benckia we bike di riya dayina hin dermanan bi derziya kanûl (bo agahdariyên bêhtir li ser vê yekê li jêr binêrin). Kêm zêde, dibe ku ji we bixwazin ku hûn gazek wek bêhna pênûsên nîşanê bikêşin. Bijîşkê benckir dê şêwaza herî baş bo we, bi we û dêûbavê we yan nihêrvan we re gengeşe bike.
- Dayîna derman bi rêya derziya kanûlê rêya herî zû ye ku hûn benc bibin. Dema hûn gazê bikêşin, piştî ku hûn di xew de bûn, hûn ê kanûlek têxin tamarên we, ji ber vê yekê bijîşkê benckir dikare di vê pêvajoyê de dermanên benckir, dermanên êşbir an derman û şilavên din bêhtir bidine we. Herdû rêbaz jî dibe ku hîsa gêjbûne bidin we beriya ku hûn di xew re biçin.
- Heger hûn bixwazin, dêûbavê we yan nihêrvanê we dikarin bi we re bimînin heta ku hûn ji hişê xwe herin. Piştî wê, ew dikarin li jûreyek bendewariyê an jî li beşê li benda we bin. Wekî din, hemşîreyek dê bi we re bimîne dema ku penc dest bi kar dike.

Kanûl

- Derziya kaûlek plastîk a tenik û nerm e ku bi gelemperî di damarê li piştê destê ee bi cih tê kirin.
- Dibe ku krêmek bo tevizandinê yan sprêyeke sar a taybet bo piştê destê we ji we re bê pêşkêş kirin, ta ku her nerehetiyên we dema bichkirina derziya kanûlê kêm bibin.
- Derziyek zirav tê bikar anîn da ku kanûla têxin hundur, paşê derzî yekser tê rakirin.
- Dema ku derziya kanûla li cîhê xwe be, dermanên we dikarin bi wê re bêyî ku ti derziyek din bikar bînin werin dayîn. Hendek carinan ev dibe sedema piçek sarbûn, xitimandin an nerehetiya sivik.
- Bi giştî piştî niştergeriyê kanûla we di cîh de tê hiştin ku hûn paşê hewceyê dermanên êşbir, şilav an dermanên din bibin.

Di dema penckirinê

- Bijîşkê benckir dê her dem bi we re bimîne.
- Karê bijîşkê benckir ew e ku we ewle bihêle û dermanê benckir û sivikkirina êşê baş bide we ku hûn di xew de bimînin heya ku niştergeriya we bi dawî bibe.
- Bijîşkê benckirê di tevahiya niştergeriyê de we ji nêz ve dişopîne (fişara xwînê we, rêjeya dilê û bêhngirtin jî tê de).

Piştî şiyarbûnê

- Niştergerî û test hemû demên cuda didomin, lê gava ku rêkar qediya, bijîjk dê dayina dermana bencê rawestînin. Ev ê bihêle ku hûn bi qasî pencê deqe şûnda şiyar bibin.
- Hûn ê di odeya başbûnê de şiyar bibin, lê dibe ku hûn çend hûrdemên pêşîn ji bîr bikin an jî tê negihêjin bê hûn li ku dera ne. Dê endamek perwerdekirî ya fîmê odeya niştergeriyê, bi gelemperî hevşîreyak başbûnê, haydarî we be.

- Çawa hûn paşê hîs bikin dê bi celebê rêkar û benckira ku we ve girêdayî be. Dibe ku hin kes êş û zuhabûna qirikê an jî serêş hebe, an jî hinekî xewê hîs bikin. Bijîşkê benckira we dê bi gelemperî dermanên dijî verşiyê an dijî hîsa wê bide we, lê hunê baştir hîs bikin dema ku hûn tişkî bixwin an vexwin. Carna dibe ku hûn bi sermê hîs bikin an bilerizin. Di wê rewşê de dê betaniyek ji we re bê pêşkêşkirin da ku we germ bike.

Dermankirina êşê

- Pêşgirtin û dermankirina êşê girîng e û pêdiviya hin kesan (û hin cureyên niştergerî) bi dermanên sivikkirina êşê bêhtir ji kesên din û cureyên din heye.
- Beriya ku êş xirab bibe dermankirina êşê hêsantir e, ji ber vê yekê divê hûn jî hevşîreya başbûnê an jî ji bijîşkê benckir afikariyê bixwazin her gava ku hûn dest bi nerehetiyê dikin, li şûna ku li bendê bimînin heya ku rewşa we xirabtir bibe.

Vegerandina li beşê nexweşxanê

- Dibe ku hûn di destpêkê de pir westiyayî hîs bikin.
- Eger pirsgrêkên we hebin, kesekî agahdar bikin da ku ew bikaribe afikariyê bike. Dibe ku hûn neçar bin ku zingilê bixin an jî ji dêûbavê xwe an ji nihêrvanê xwe bixwazin ku ji we re hemşîreyek bibînin.
- Çiqas zû hûn dikarin dîsa bixwin û vexwin, dê bi celebê rêkar û dermanên êşbir ku we vexwaribe ve girêdayî be. Hemşîre an jî bijîşkê benckira we dê şîretan li we bikin.
- Hûn ê li nexweşxaneyê bimînin heta ku ewle be ku hûn vegezin malê. Di gelek rêkaran, hûn dikarin di heman rojê de biçin malê heke hûn bi gelemperî saxlem bin û rêkar rasterast be.

Talûke yên ku bi benckirina we ve girêdayî ne

Benckirên nûjen pir ewledar in. Hin bandora alî ên hevbeş ên dermanên bencê an amûrên ku têne bikar anîn hene, ku bi gelemperî ne ciddî ne an demdirêj in. Bijîşkê benckir dê bi we û dêûbav an nihêrvanê we re li ser talûke yên ku ew bawer dikin ku ji bo we girîngtir in nîqaş bike. Hûn dikarin li ser malpera me bêhtir derbarê metirsiyên benckirinê bi zimanên cuda bixwînin:

www.rcoa.ac.uk/patientinfo/translations#languages.

benckirina herêmî û taybetcihî

- Carinan hûn dikarin hîlbişîrî ku di dema niştergiya xwe de hişyar bimînin. Eger ev îhtîmal hebe, nişterger û/an bijîşkê benckir wê bi we û dêûban an nihêrvanê we re nîqaş bikin. Di wê rewşê de, hûn dikarin derzîkirinên yên benckira herêmî bibin da ku beşek laşê we bitevizînin, û hûn li wir êşê hîs nekin.
- Ger hûn dibînin ku hûn dikarin şiyar bimînin, hûn dikarin wê yekê di nixandina xwe ya pêşîn de gengeşe bikin.

Heke hûn dixwazin bêhtir fêr bibin

- Hûn dikarin bêtir agahdarî ji malpera me bisfînin:
www.rcoa.ac.uk/patientinfo/translations#languages.

Destjêkişandin

Em gelek hewl didin da ku agahiya li vê namilkeyê durist lidar bixin û nûvejen bikin, lê em nikarin li vê ewlehî bikin. Em guman nakin ku ev agahîya gelemper bibe bersivên hemû pirsên we yê gengaz an jî bibe çareserîya her tiştên ji bo we girîng. Bi riya bikaranîna vê namilkeya ku wek pêşber, divê hûn bi fîma bijîjkî ra li ser bijarîyên û metirsîyên xwe bikevin nîqaşê. Divê ev namilkeya xwe bi xwe wek şêwîrek neyê bidesthilgirtin. Ev jî bo armancek bazarî an jî karî nayê bikaranîn. Ji bo redandina berpisriyarîyê, ji kerema xwe ra li vir bitîkînin (www.rcoa.ac.uk/patient-information/translations/kurmanji).

Hemû wergeran jî alî wergervanên ji civaka Translators Without Borders (Wergervanên Bêsinor) tînin çêkirin. Çawanîya van wergeran jî bo duristîya van heta jî dest tînin venihartin, lê xetere heye ku hin agahîyan nedurist bin û çewt hatibin wergerandin.

Ji me re bêjin ka bê hûn çi difikirin

Em pêşwaziya pêşniyarên ji bo baştirkirina vê belavokê dikin.

Ger tîbînîyên we hene ku hûn dixwazin pêşkêş bikin, ji kerema xwe bi riya e-mail bişînin li ser: patiinformation@rcoa.ac.uk

Royal College of Anaesthetists

Churchill House, 35 Red Lion Square, London WC1R 4SG
020 7092 1500

www.rcoa.ac.uk

Çapa çaremîn, Cotmeh 2024

Ev belavok dê di nav sê salên piştî roja weşanê de were nixandîn.

© 2024 Royal College of Anaesthetists and Association of Paediatric Anaesthetists of Great Britain and Ireland

Dibe ku ev belavok jî bo çêkirina bûjena agahiya nexweşan were kopîkirin. Ji kerema xwe vê çavkaniya orijînal binivîsin. Heke hûn dixwazin beşek ji vê belavokê di weşanek din de bikar bînin, divê pejirandina gunca were dayin û logo, marka û wêne werin rakirin. Ji bo agahiyên zêdetir, ji kerema xwe bi me re têkiliyê danin.